Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1310 24-Îlon-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Şûnwarên bajarê Dêrikê

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Bajarê Dêrik wekî tevahî bajarên Rojavayê Kurdistanê bi cihên dîrokî û şûnewarên xwe zengîn e. Her şûnwarek çîrok û serpêhatiyên mirovên ku di demên borî de li ser vê axê jiyan kirine, vedibêje.**

### Avakirina Qijle

Di sala 1923’an de hêzên Feransî derbasî herêma Dêrikê dibin û ji bo xwe navendan ava dikin. Heya niha jî navlêkirina Zexîre vedgere cihê leşkerî yê ferensiyan. Hin bi hin Feransî hatin heya gihan bajarê Dêrikê, destpêkê berê xwe dan Eyn Dîwerê li wir Qayîmeqamiya xwe ava kirin û bi salan li wir man.



Ji ber ku di navbera wan û dewleta Tirk de nakokî hebûn berê xwe dan bajarê Dêrikê di sala 1929’an de wargeheke leşkerî li bajarî Dêrikê ava kirin û navê wê kirin Qijle. Qijle ji kevirê reş hatiye avakirin, di heman demê de cihê vê navendê li ser gir e da ku li ser herêmê hakim be. Qijle navê navenda leşkerî lê dihat kirin ku ji du qatan pêk dihat, qata yekem cihê bêhnvedana leşkeran bû û qata duyam jî cihê parastinê bû. Herwiha li ser serê Qijle entêlên pêlên radiyoyê hebûn ku leşkeran bi riya van pêlan têkilî bi hev re dikirin da ku pêdiviyên xwe pêk bînin. Hin dibêjin ku piştî avabûna Qijlê Feransiyan êdî dest bi avakirina bajarê Dêrikê kirin, herwiha hin dibîjin ku beriya Feransî werin kesê bi navê Hemko Dêrik wek xirbeyekî ava kiribû.

### Pira Bafid

Yek ji cihên dîrokî yên Dêrikê Pira Bafidê ye ku dikeve bakurê Êyndîwer û bakurê bajarê Dêrikê, herwiha nêzî 5 kîlometreyan li binya Cizîra Botan e. Ev pireke istatîjîk e ku Bakurê Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê bi hev du ve girê dide. Mîreşîn û dewletan ev pir gelekî bi kar tanîn ji bo bazirganiyê, ji ber ku ava Dicle ji bo wan dibû asteng, lewma erêkirin ku ev pir were avakirin. Di heman demê de şer di navbera Mîreşîn û dewletê de hebû, dema dewlet dihatin da ku êriş bikin, çemê ava Dicle dibû asteng li pêşiya artêşên wan lewma xwestin ev pir çêbibe da ku di şeran de jî were bikaranîn. Pira Bafid di gelek qonaxan re derbas bûye û gelek nêrînên cûda li ser avabûna wê hene. Lê dayîreya lêkolînan a mislimanan dibêjin ku ev pir di dema Zengiyan de hatiye avakirin.



### Çîroka pirê Bafid li gorî gel

Li gorî niştecihên Dêrikê dibêjin ku Pira Bafid li ser destê Mîrekî ji Cezîra Botan di sala 1164’an de hatiye avakirin. Ev mîr navê wî Cemaledîn bû û pir bi dstê hostayê ermenî Hena hatiye avakirin. Dibêjin dema ku mîr ji Hosta Hena xwest ku vê pirê ava bike hosta destpêkê razî nebû, lê keça mîr xwe gihand hosta û du kîsên dagirtî zêr birin û her kîsek avêt aliyekî avê, paşê ji hosta Hena re got ku eger tu lingekî pirê li wir ava bike ew kîsê zêran wê ji te re be û tu yekî li vî alî ava bike ev kîsê din jî wê yê te be. Hosta Hena ev pir ji kevirê baziltî û kevirê kilisê ava kir, ev kevir ji çiyayê Dêra bûn. Ji ber ku ew hostayekî zana bû bi pisporî ev pir ava kir, her kevirekî ku li wî milî datanî li vî milî jî beramberî wî danî da ku şaş nebe.

Pira Bafid ji sê lodikan, 5 kevanan û ji şeş stûnan pêk dihat, lê di dema niha de lodikek, kevanek û du stûn mane. Dirêjahiya pirê 141 metre bû, bilindbûna wê jî 15 metre bû û stûrbûna stûna wê 10 metre fereh bû, pehinbûna pirê ji 4 heya 6 metreyan bû. Vê pirê hişt ku bajarê Cizîra Botan bibe bajarê yekemîn di milê bazarganiyê de. Kurdan ji vê pirê re digotin pira Bafid ev yek vedgere du nêrînan, hin dibêjin ji ber ku kevirê wê yê bazilt e lewma Kurdan navê wê sivik kiriye û bûye Bafid, hin dibêjin ku êvaran mîrê Cizîra Botan xwedî li rê derdiket, bi mûm û xetîra rê ronî dikir, ba li agirê wan dida û difrand lewma navê Bafid ji Bafir hatiye. Herifandina pira Bafid vedgere du sedema yek ji ber ku çemê ava Dicle gelek xurte û dagirkeran tu guhdan nedayê de lewma wiha herifiye. Sedema din jî dibêjin dema hosta Hena avakirina pirê bidawî kir mîr Cemaledîn destê wî jêkir da ku pireke din wek wê ava nekê, hosta Hena jî da ku heyfa xwe ji wan hilîne ji mîr re got hîn boyaxkirina vê pirê maye, dema ew boyax lê kirin di nav poyaxê de heyberên kîmawî hebûn ku bi demê re van keviran bihelînin û sist bikin, lewma dema pêlên avê li wan diketin diherifî.

## FERHENGA BIWÊJAN

**Li bêhna kebabê çû bi ser daxdana keran ve bû:**
- Bi çi niyetê çû bi ser çi ve bû; bi hêviya tiştekî baş çû lê rastî tiştekî nebaş hat.

**Lingê wî sefik negirt:**
- Bi ser neket; negihat armanca xwe. (Sefik: Meledokê li ber dîwarî xanî ji aliyê derve ve)

Me bûk anî lezobezo sivika malê bûm ezo
- Tişta me hêvî dikir pêk nehat; weke daxwaziya me çênebû; em xusirîn.

**Me bûk anî lez û bez, me lê da rez û pez, sivika malê dîsa ez:**
- Bi heman wateyê.

**Min dît qîza bikezî, min dayîk dît dilê min ji keçê tezî:**
- Tiştekî dibîne ew tişt dibe sedem ku dilê wî ji tişta pê ve çûyî sar dibe.

**Patika xwe xwerand:**
- Tişta ku dixwest bi dest neket.

(Dema xwestekên yekî pêk nayên, yan xeyalên wî dikevin avê hingê dibêje. Dema tiştin ji yekî tên pirskirin û nizanibe, yan jî şaş bersivê bide hingê jî tê gotin)

**Xeyala wî ket avê:**
- Tiştên di serê xwe de digerandin pêk nehatin.

**LI SER XEMIL Û XWEŞIKBÛNÊ**

**Bûka Baranê ye:**
- Pir bedew e; pir bi xemil û şemil e.

**Çav li ser qerimîn:**
- Bi heman wateyê.

**Çav lê zeliqîn:**
- Bibheman wateyê.

**Çav li ser cemidîn:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

📷 Bi kamîreya Hemza Sêvo



## ‘Êriş bêbersiv namînin, bersiva wan jî wê xurt be’



Rêveberiya Meclisa Leşkerî ya Kantona Firatê Mihemed Mistefa Elî diyar ku li hemberî êrişên berdewam ên li ser herêmê QSD'ê xwedî bersiva xurt e, heya niha jî DAIŞ xwe zindî dike...**R-3**

## ‘Girêdayî têkiliyên Rêveberiya Xweser û Lubnanê danûstandin berdewam in’



Nûnerê Rêveberiya Xweser li Lubnanê Ebdulselam Ehmed da zanîn ku peywendiya bi partî û hikumeta Lubnanê re, peywendiyeke danûstandin û diyalogê ye...**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1310 24-Îlon-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# HIŞMENDIYA HERÎ XETERNAK LI SER HEBÛNA JINÊ; HTŞ’Ê

Berdevka Meclisa Jin a Kongreya Islama Demokratîk Emîra El-Ezo da zanîn ku bi hatina hikumeta veguhêz a HTŞ'ê li ser deshilatdariya Sûriyê, li dijî pêkhate, ol û netewan, bi taybet li dijî jinan komkujiyên mezin hatin kirin û wiha got:"Hişmendiya HTŞ'ê ku li ser bingeha wê Sûriyê tê birêvebirin, li ser vîn û hebûna jinê xeteriyeke mezin ava dike."**R-2**




## Bandora şer li ser mirov û jiyanê... (2)



Di şerê Efxanistan û Îraqê de her çiqasî lîstikvan an jî rêbaz hatibin guhertin, lê belê di cewhera xwe de proje û armanc yek bûn, ew jî şerê desthilatdariyê û berjewendiyan bû. Lê yên ku herî zêde ziyan dîtin sivîl bûn, bi taybet jin û zarok bûn qurban. **R-4**

## ‘Armanca Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan parastina kevneşopiya civakê ye’



Hevseroka Navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê Bêrîvan Elî diyar kir ku Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan kar û xebatên pîroz dide meşandin û wiha got: “Armanca Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan parastina kevneşopiya civakê ye."**R-7**

## Avabûn, armanc û xebata Kongreya Islama Demokratîk



Kongreya Islama Demokratîk saziyeke olî ye ku kar û xebata xwe li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê dimeşîne. Endamê rêveberiya kongreyê Ebdulkerîm Saroxan da zanîn ku armanc ji avakirina kongreyê ew e ku qada olî were birêxistinkirin, civak li dijî Islama siyasî û radîkal derkeve. **R-6**

**Jinên Sûrî wê ji bo xwe çi biryarê bigrin?**
Nehîr Pale R-2

**Ew ê di dawiyê de bi “Hevalê min Trump” re hevdîtin bike!**
Zekî Bedran R-5



**Hikumeta HTŞ’ê dixwaze peymana 10’ê Adarê têk bibe**
Dilyar Cizîrî R-4



**Sozên ku Colanî dabû Ewropiyan**
Farûk Sakik R-5

# 'Hikumeta Veguhêz bi navê ol pirrengiya Sûriyê û hebûna jinê tune dike'

Berdevka Meclisa Jin a Kongreya Islama Demokratîk Emîra El-Ezo da zanîn ku zihniyeta di Sûriyê de tê meşandin ne li gorî ola Islamê ya resen e û got, "Hikumeta heyî bi navê olê hebûna jin tune kiriye".

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Piştî hatine Hikumeta veguhêz zihniyeta ku di Sûriyê de tê birêvebirin, di bin ola Îslamê de mafê hemû netew, ol, pêkhate û civakan tune bûye. Bi vê zihniyetê dixwazin yek rengî li ser mozeyîka ku di Sûriyê xwediyê wê ye ferz bikin. Bi vê hişmendiyê di nava 9 heyvan de him bi navê ol û him jî di bin sernavên ku girêdayê rêjîma berê ne bi hezaran kes hatin qetilkirin û komkujê pêk hatin. Di nava vê yekê de bi şemala ola Îslamê hebûna jinê yek carî tune kirine û tu maf, nêrîn û hizir jê re nehêştine. Têkildarî vê mijarê Berdevka Meclisa Jin a Kongreya Îslama Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Emîra El Ezo ji Rojnameya me re axivî.

**Bi ola Îslamê tunekirina pirrengiya di Sûriyê de**

Emîra di destpêkê de bal kişand ser zihniyet û sîstema ku ji aliyê hikumeta veguhêz ve tê meşandin û wiha got: "Gelê ku 56 salan di bin sîstemeke dîktator û tundrew de jiyan dikir, 14 sal ji kirîzan û talankirinê kişand. Di bin serweriya rêjîma Baas de tu mafê pêkhateyan nîn bû, net û zelal tenê yek reng hebû ew jî "tu Erebekî Sûrî" ye. Tu li dijî sîstemê serî ranekî derveyî wî tu çi dikî bike. Bi vê hişmendiyê mefê tu ziman, çand û pêkhateyan qebûl nedikir.
Bi hatina hikumeta veguhêz re, ji gelê Sûriyê re weke ku şewqa azadiyê hat û 14 sal ji qeyran, êş û zehmetiyan bidawî bûye ye. Lê tişta ku hatiye kirin ne li gor hêvî û xeyalên gelê Sûriyê bû. ger berê sîstemekî dîktator dihat meşandin bi hatina hikumeta veguhêz re, komkujî û qirkirin li ser ol, bawerî û pêkhateyên di Sûriyê de hate meşandin, êdî tirsa di dilê gelê Sûriyê de ji berê mezintir bû. Bi taybet di mijara jin de tu rola jin ne di sîstem, civak û malbatê de nehêşt û qebûl jî nake. Di welatekî ku bi dehan ji ol, bawerî û pêkhateyan jiyan dike, dixwaze bi ola Îslamê hemû rengên din tune bike û yê ku li dijî wan disekine tê qetilkirin. Helbet baweriya me bi vê hikumetê ne wiha bû û bi vê hişmendiyê wê nikaribe demdirêj bimîne û bê qebûlkirin".

**Rewşa jin bi hişmendiya Îslamê re**

Emîra di berdewamiya axaftina xwe de destnîşan kir ku jina Sûrî di nava vê hişmendiyê de nikare bibe hebûnek û wiha domand: "Jina Sûriyê di nava ewqas sal ji kirîz û qeyranan de, gelek êş û zehmetî kişandin. Em her tim dibêjin ku a herî zêde di nav şeran de dibin qurbanî jin in. Ji ber jin him di malbatê de xwedî erk û berpirsyartiye û him jî ji aliyê civakê ve rastî zext û hişmendiyên paşverû tê. Bi van her du yan re dixwaze hevsengiyekê di jiyanê de ava bike. bi qasî ketiya derdê derdor, malbat û zarokan, êdî hebûna xwe ji bîr kiriye. Di nava hikumeta heyî de li kêlek qirkirin û komkujiyên pêk anîne de, bi tayebet di mijara jin de hîn bi tundtir û qalibtir nêz dibin. Ger berê jin di Sûriyê de destwerdan li cil, şekil û şemala wê nedihat kirin, bi hikumeta veguhêz re ev xisûsa jin jî ji det derket û dixwazin şeklekî nû li jinê bisipêrin. Bi navê Îslamê li ser jin hemû kiryarên dij mirovî ji girtin, revandin, tecawîzan pêk anîn. Bi dehan jinên Berava Sûriyê û Siwêdayê hatin girtin û kuştin.
Hikumeta veguhêz li şûna ku hemû pêkhate û rengên di Sûriyê de nêzê xwe bike û hebêz bike li dijî wê siyaseteke xirabtir di bin navê ol de meşand. Di nava hikumeta heyî de tu rengê jinê nîn e. Ger hikumeta nû bi vê rengî dewam bike em ê hebûna jina Sûrî winda bikin. Bi yek zihniyetê wê Sûriye neyê avakirin. Ola Îslamê ji me re nabêje ku divê jin bê tunekirin, berûvajî wê di ayetên Qurana Pîroz de dibêje divê em xwedî li jinê derkevin. Pêxember Mihemed di heca dawiyê de çû ser menberê û got "Estawsû bi nîsae xeyren" yanî bi başî li jinê xwedî derkevin. Ev wesiyeteke divê ev kesên ku bi navê Îslamê wiha dikin, werin teşhîrkirin. Di destûra Sûriyê a nû de divê jin hebin rola jin derkeve pêş. Di serdemeke ku ewqas guhartin tê de çêbûne ne gengeze ku em rewşa jin wiha qebûl bikin".

**'Em Sûriyeke demokratîk dixwazin, ne bi navê ol mayîndekirina xwe'**

Emîra di dawiyê de da zanîn ku ew Îslama Demokratîk û hemû Bakur û Rojhilatê Sûriyê yekbûyîn û demokratîkbûyîna Sûriyê dixwazin û got: "Li ser ragihandin û di mejiyê wan de dixwazin diyar bikin ku em wek herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê



li dijî ola Îslamî ne û hwd. Di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hemû netew, pêkhate, ol û bawerê bi hev re bi azadî, maf û rengê xwe jiyan dikin. Mafê jin li ser her tiştî re û ev yek di 14 salan de hatiye îsbatkirin ku çawa jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe pêşengtiyê ji şoreşê re dikin.
Em li Bakur û Rojhilatê Sûriyê weke ku me ji destpêka şoreşê û heyanî niha jî gotiye û dibêjin, em li dijî perçekirina Sûriyê ne û em avakirina Sûriyeke demokratîk û ne navendî dixwazin. Divê cewhera îslama exlaqî û mirovî derxînin, ji bo tu kes neyê bi navê Îslam û Pêxemberan gelan qir neke û tune neke. Ma gerdûn tenê bi ola Îslamê hatiye avakirin? helbet na, hemû ol û baweriyên din jî yên xweda ne. Divê em bi vê re bizanibin ku jiyan û gerdûn bi pirrengiyê hatiye geşkirin. Tu mafê kesekî nîne ku xwe li ser yê din feriz bike ev ne ola Îslamê vê qebûl dike û ne jî tu ol û baweriyê din. Ger ew ji me re dibêjin hûn li dijî Îslamê ne, em li dijî hişmendiya DAIŞ'ê a ku ew dixwazin nûjen bikin e, em li dijî bikaranîna ol in ku ji bo xwe serwer bikine, em li dijî qetilkirin û qirkirina gelan bi navê ol in".

# 'Veşartina kuştina jinan, tirsa ji eşkerekirina rastiya zihniyeta zilam e'

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

**Rêveberiya Rêxistina Sara Arzû Temo diyar kir ku Sûriyê bûye navenda kuştin û tundiyê, li heremên dagirkirî û heremên di bin serweriya HTŞ'ê de revandin û kiryarên li ser jin zêdebûne û wiha got: "Veşartina kuştina jinan, tirsa ji eşkerekirina zîhniyeta zilam e."**

Di vê çarçoveyê de Rêveberiya Rêxistina Sara Arzû Temo ji Rojnameya me re axivî.

**'Zihniyeta desthilatdariyê hîn nehatiye guhertin'**

Arzû Temo da zanîn ku ji 5 hezar sal ve û heya roja me ya îro zilamên desthilatdar tundî û kuştin li ser jinê ferzdikin û wiha got: "Kuştina jinan li ser destê bav, bira û hevjîn di bin navê Namûsê de tê kirin. Gelek caran malbat keç û hevjînên xwe dikujin û dibêjin ku xwe kuştiye, lê dema ku bijîjkê dadwerî li cenazeyê temaşe dike xuya dike ku ew kes hatiye kuştin ne xwekuştin e. Gelek malbat xwe demokratîk nîşan didin, lê li kêleka wa tê dîtin ku hîn zihniyeta desthilatdariyê di nava hin civakan de nehatiyen guhertin. Kuştina jinan bi awayekî veşartî tirsa ji zanîna rastiyê ye, ew zihniyeta paşverû mixabin di nava civakê de hîn ji xwe didomîne. Azadî û helwesta jinê hîn jî qebûl nakin, dema ku jin vê yekê red dike rastî lêdan û kuştinê tê. Êdî tevahî civaka Sûriyê divê xwe ji vê zihniyetê rizgar bike, ev civak bêyî jinê temam nabe."

**'Ji bo hişyarkirina jinan semîner tên dayîn'**

Arzû Temo diyar kir ku ji bo hişyarkirina jinan ew semîneran didin û wiha domand: "Zihniyeta baviksalar hîn jî didome, ev zihniyet bi piranî di nava pêkheteyên Ereb de derdikeve pêş. Ji bo hişyarkirina van jinan û nasîna mafên xwe semîner tên dayîn. Herwiha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî carinan bûyerên wisa diqewimin. Ji bo vê jî semîner li ser guhertin û veguhertina zîhniyeta paşverû ya malbetê tê dayîn, ka ku em alîkariyê bi tevahî jinan re bikin, wan ji tundiyê û bindestiyê ku li ser wê hatiye ferizkirin xilas bikin. Me li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hejmara telefonê belav kirin, dema pirsgirêk û astengî bi jinê re çêbû xwe bighînin me û em bi wan re alîkar bin. Hêviya me ji tevahî jinan ew e ku bêtirs, bertekên xwe nîşan bidin ku em bibin alikar da ku ji wî zordariyê bên xilaskirin ."

**'Li herêmên dagirkirî di zîndanan de îşkence li ser jinan didome'**

Rêvebera rêxistina Sara Arzû Temo axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Li herêmên dagirkirî rêjeyeke zêde jin têne revandin û dikevin zindanan, di van zindanana de jin rastî îşkence, lêdan û tecewîzê tên. Rêjeyek zêde jinên ku hatine revandin çarenûsa wan nediyare. Wek Rêxistina Sara derfet nebûn ku em xwe bigîhînin heremên dagirkirî, ji ber wê jî asta ku dihat



xwestin de me nekarî xwedî li jinan di heremên dagirkirî de derkevin. Lê ji bo redkirina van tundiyên li dijî jinan me çalakî, daxuyanî û meş li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dardixistin. Herwiha dema ku jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dihatin kuştin, em dibûn aliyek ji hesabxwastinê û çareseriyê. Heya ku rastiya kuştina jinan û hesabxastin ji sûcdar neyê xwastin em ranewestin. Em ji rêxistinê mafê mirovan a cîhanê û rêxistinên jinan, xasteka hesabxwastinê ji kesê sûcdar dikin û ew jinên ku hatine revandin li ser destê DAIŞ'ê û HTŞ'ê werin berdan û çarenûsa jinên di zindanê de were diyar kirin."

## Ji Pênûsa Jin

### Jinên Sûrî wê ji bo xwe çi biryarê bigrin?

**Nehîr Pale**

Di vê pêvajoya Sûrî têre derbas dibe jinên Sûriyê wê çarenûsa xwe diyar bikin. Pêvajoya ku ez behsa wê dikim ji ketina sîstema Baasê 8`ê kanûna 2024`an heyanî niha ye. Sûrî niha di rewşeke ne diyar de ye, wê kî birêve bibe, sîstem çawa be, stratejiya wan çi be, gelo destûra xwe bidin guhertin an na? Ev pêvajo ji bo jinên Sûrî girînge û divê biryar bidin wê çawa bijî. Bi giştî rewşa wan mîna hev e, hemû pêkhateyên Sûriyê bi heman zîhniyet, feraset, rê û rêbazan nêzî jinê dibin. Rewşa ti jinê ji ya dîtir nebaştire, karker be, cotkar be, karmend be yan jî dayîk be di heman şert û mercan re derbas dibe. Di salên Şoreşa Rojava de derfet çêbû ku jin ciyê xwe di hemû xebatan de bigre, xwe birêxistin bike û xwe pêşbixîne. Niha jin gihîştine asta ku biryara xwe bidin û çarenûsa xwe diyar bikin.
Li Herêma Bakur-Rojhilatê Sûriyê gelek navend, meclis û saziyên jin vebûne. Di hemû rehendên Rêveberiya Xweser de jin hene û niha berpirsyartiya rêvebirina sîstema hevserokatiyê rakirine. Tecrûbeyên jin di xebatên rêveberiyê de, çareserkirina pirsgirêkên jin, xwedî li jinê derketin û xebatên perwerde dayîna meşandin, çêbûne.
Em werin ser mijara herî girîng ew jî jinên Sûriyê wê ji bo xwe çi biryarê bidin? Dibe ku kesekî ew nexistibin giraniya pêdiviyeke wisa de. Tevlîbûna xebatê û rêvebirin, xwe birêxistin kirin girînge, lê belê têrê nake ku pirsgirêka zayendperestiyê were çareser kirin. Jinên Sûrî jî mîna hemû jinên cîhanê gelekî şikestîne. Ji zextên malbatê û civaka zayendperest rev û tevlîbûna xebatê, yan jî ji bo em pêdiviyên xwe yên aborî pêk bînin, tevlî xebatê dibin têrê nake ku em biryar bidin bê em ê çawa bijîn an jî em çi dixwazin. Pêdivî heye ku her tim di nava lêgerîna çareseriyê de bin, ji guhertin û veguhertinê re vekirî bin. Têkoşîn kirin ji bo jinên Sûriyê ji nan, av û hewayê girîngtire ango çiqasî ciyê xwe di qada siyasî, civakî, dîplomasî, aborî û leşkerî de bigrin wê ewqasî deriyê çareseriyê li wan re vebe. Eger bê berpirsyar nêzî rewşa Sûriyê bibin û ciyê xwe di nava têkoşînê de negrin, wê sîstem dîsa mîna berê nêzî jinê bibe û wê ji hemû mafên wê mehrûm bike.
Di bin navê ol de wê ji çeteyên DAIŞ`ê xirabtir zagonan ji jinê re deynin û her tiştî li ser qedexe bikin.
Çawa niha jiyanê li jinê dikin dojeh wê sibe jî heman tiştî bikin. Ji destpêka hilweşandina sîstema Baas de diyar bû ku hikûmeta nû wê di sîstema xwe de cî nede jinê. Li bajarên Sûriyê yên Beravê û Siwêdai heman rêbazên çeteyên DAIŞ`ê dan meşandin. Jin revandin, destdirêjî wan kirin û ew kuştin. Eger jinên Sûriyê li beramberî van nêzîkatiyan bêdeng bimînin wê dawiya hemûyan serî tewandin, destdirêjî û kuştin be. Hikûmeta heyî girîngî nade jinê û tucarî behs nekiriye ku li Sûriyê pirsgirêka zayendperestiyê heye û dibe were çareser kirin. Bi riya têkoşîna siyasî û qanûnî xwedî li hebûna xwe derbikevin.



# Ji ciwantiyê heta 70 saliya xwe eşqa şanogeriyê di dil de maye

Şanoger Yûnis Ehmed ji ciwaniya xwe ve heta 67 saliya xwe êşa gelê xwe di rêya kar û xebata xwe ya şanogeriyê de tîne ziman. Yûnis Ehmed dibêje; "Ji bîst salî ve ez bûm aşiqê karê şano ji ber wê ez heta niha berdewam dikim. Herwiha armanca min jê ew e ku, ez êşa gelê xwe bînim ziman. Lewra karê çand û hunerê di rewşên şer de mîna karê çekdarî ye."

**Dilîm Ehmed/Qamişlo**

Di dîroka gelê Kurd de li gel têkoşîna azadiyê, karê şanogeriyê jî pêşketiye. Di têkoşîna azadiya Kurdan de bi sedan şanoger ku cihê xwe tê de girtine hene. Ev şanoger bi lîstikên xwe yên ser dikê, têkoşîna civaka Kurd ya li hember zordariyê hem jî li gel têkoşeran ji bo azadiya gelê xwe şer kirine û êşa li hember desthiladaran bi kar û xebata xwe tînin ziman. Yek ji van şanogeran jî Yûnis Ehmed e.
Şanoger Yûnis Ehmed di sala 1960'an li gundê Qijlê yê girêdayî bajarê Amûdê hatiye dinyayê. Yûnis di malbatê de yê herî mezin e, 7 xwîşk û 4 birayên wî hene. Heta deh saliya Yûnis malbat li gund dijyan piştî wê berê xwe dan bajarê Hesekê li gundan dest bi karê avdana zeviyan dikin. Piştî deh salan malbat berê xwe didin bajarê Qamişlo û li wir bi cih dibin. Di salên 1980`î de dema ku li Bakurê Kurdistanê derbeya leşkerî çêdibe û xwndekarên Kurd dest bi doza mafstnadina xwe dikin, li hember desthildariya tirkiyê dest bi serhildanan dikin. Yek jê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bû. Di wê demê de ji ber birîyarên dewleta tirk ya girtin û kuştina li dijî xwepêşandanan, gelek ciwan neçar man ku berê xwe bidin Rojavayê Kurdistinê. Du ciwan ji wan berê xwe didin malbata Yûnis Ehmed û çend rojan malbat wan pêşwazî dikin, bi vî awayî Yûnis û birayê xwe fikir û



felsefeya Rêber Abdullah Ocalan nas dikin.

**Azadiya xwe di tevgerê de hîz kir**

Carnan jê mirov neçar dibe ku ji bo peydakirina pêdiviyên jiyanê dûrî malbat û cihê ku lê mezin bûye bikeve. Di sala 1987`an de Yûnis Ehmed jî yek ji wan kesan bû ku ji bo peydakirina pêdiviyên jiyana malbata xwe berê xwe dide Şamê û dest bi karê avahiyê dike. Li wê derê jî Yûnis çend kesên welatparêz nas dike û xwe tevlî fikir û ramanê Partiya Karkerê Kurdistan (PKK) kir. Ji wê demê û heta niha ew ji bo xizmeta gelê xwe çi jê tê xwestin pêk tîne. Çimkî jiyaneke rast û wekhev di vê tevgerê de dîtiye.
Yûnis Ebdulmecîd Ehmed ku piraniya xelkê Qamişlo bi navê bavê Ciwan nas dikin, piştî ku li Şamê dizewice tevlî malbata xwe careke din berê xwe dide bajarê Qamişlo li taxa Hilêliyê bi cih dibe û bi taketina wî re rest xwe tevlî karê cebha dike. Yûnis wiha dibêje: "Tevî ku di wê demê de kêm hosteyên avahiyan hebû û rewşa min ya madî ne baş bû, lê ji ber eşqa min ya ji tevgerê re min dev ji erkê xwe ya welatparêziyê bernede. Lewra min heta niha mîna vê fikir û berxwedana ji bo azadiya gel û azadiya jinan ji bindestiyê, di cîhanê tevê de nedîtiye. Bi taybetî berxwedana di zindana û serê çiya de."

**Şoreşa Rojava hesreta dilê wî bi cih anî**

Di dawiya salên 80`yî de Yûnis di nava koma şanoyê de cihê xwe digire, ji wê rojê heta niha li ser şano û kurte filîmên Kurdî dixebite. Ji piçûkaniya xwe de ew pir ji lîstike ser dikê dike mirov dikare vê bêje jêhatiya wî şanogerî ye. Beriya lidarxistina Şoreşa Rojava di dema ku rejîma Baas li ser desthiladariyê bû, Yûnis û hevalekî xwe ji bo temaşekirina şanoyekê, diçin navenda çand û hunerê li wê derê Yûnis wiha dibêje hevalê xwe: "Gelo wê rojeke were ez jî mîna van lîstikvanan li ser vê dikê bi azadî bi zimanê dayîkê şano bilîzim."

**Şano îfada gelê bindest e**

Şoreşa Rojava ne tenê ji bo bavê Ciwan bû derfet ku daxwaziyên di dilê xwe de bi cih bînin, her wiha ew ji bo tevahiya gelê herêmê bi taybetî gelê Kurd bû derfeta zêrîn ta ku li cîhanê bibin bi nav deng. Şoreşê bi saya xwîna keç û xurtên xwe gelek qad pêşxist mîna pêşxistina û parastina zimanê dayîkê, mafdayîna jinan di civakê de herwiha qada ku herî zêde pêşket qada çand û hunera gelê Kurd e. Bi pêşxistina vê qadê derfetê zêde ji Yûnis re tê ku di şano û kurtefîlman de cihê xwe bigire. Yûnis Ehmed diyar dike ku şano lêgerîna jiyanê û nexşandina jiyaneke nû û ji bo gelên blindest, şano di dîroka gel de xwedî cihekî girîng ye û wiha dipeyive: "Şano ji bo Kurdan arşîva hunera Kurdan e ku gelek xwedî dîrok li ser vê axê heye. Mirovên şanoger pêwîst e di hemû cihan karibin karê xwe yê şano bi cih bînin. Lewra karê şano di rewşên şer de mîna karê çekdarî ye. Herwiha şanoger bixwe dema di şanoyekê de ya di kurtfîlmekî de dilîze hîz dike ku ew erkê xwe yê welatparêziyê bi cih tîne."

**Ji heskirina wî ya zêde ji şano re di dilê kurê xwe de jî ev heskirin çand**

Malbata Yûnis ji pênç kesan pêk tê kurek û çar keçik. Lîstikvan Yûnis Ehmed hezkirina şano di dilê kurê xwe yê bi tenê jî çand. Ji ber ku ew fêrî xwendin û nivîsandinê ne bû, kurê xwe da bixwendin û ti kar jê ne dixwest tenê jê re pênû û lênûs dikirî û dixwest ku ew heskirina xwe ya ji şeno di dilê xwe de nehêle û girîngiyê bide xwendina pirtûkan û lêkolîna ser şanoyan. Daxwaza Yûnis pêk hat kurê wî Ciwan piştî Şoreşa Rojava tevlî karê çand û hunerê li naveneda Mihemed Şêxo bû û wekî nivîska, derhêner û lîstikvan xebitî. Heriwha wî hezkirina tevgera azadiyê di dilê malbata xwe de jî da avakirin. Niha keçeke wî di nava Hêzên Ewlekariya Hundirîn de weke rêveberî cihê xwe girtiye û yek jê di qada çapemeniyê de dixebite.
Hêjaye bi bîrxsitina ku Şanoger Yûnis Ebdulmecîd Ehmed (Bavê Ciwan) di kurtefîlmê Komîna Me, Berbû, Tava Sor, Evîna Kurd wekî lîstikvanekî yên ji serek lîst. Heriwiha ew di kilîpa Em Herin Gund, Li Ber Derî û Evîna Derwêş û Edûlê de cihê xwe girt.

# 'Armanca Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan parastina kevneşopiya civakê ye'

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Hevseroka Navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê Bêrîvan Elî diyar kir ku Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan kar û xebatên pîroz dide meşandin û wiha got: "Armanca Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan parastina kevneşopiya civakê ye."**

Govend berhema cerbandin û awayê jiyana mirovan a demdirêj e. Berhevbûna çandekê ye ku her dem tê domandin. Di heman demê de, berhemên folklorî bi hevkariya mirovan a bi sedê salan bi hev re hatiye afirandin.
Di navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê de, gelek kom cihê xwe digirin, yek ji wan koman jî Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan e. Di nava vê komê de 16 dayik cihê xwe digrin. Ev dayik da ku kevneşopiyên bajarê Amûdê û herêmê winda nebin, her dem di nava kar û xebatê de ne. Herwiha



Koma Şehîd Rîhan bi vê rolê dilîze û komeke xweser e. Di vê çarçoveyê de Rêvebera navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê Bêrîvan Elî ji Rojnameya me re axivî.

**'Hejimara dayîkên komê 16 ne'**

Bêrîvan Elî anî ziman ku armanca bingehîn ji avakirina Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan parastina kevneşopiya civakê ye û wiha got: "Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan kar û xebatekî pîroz dide meşandin. Herwiha ev kom di hemû şahiyê herêmê de cih digre û bi xwedî rol e. Hejimara dayîkên ku cihê xwe di nava vê komê de digirin 16 ne, ev dayîk ruxmî ewqas astengî û zehmetiyan jî xebatên xwe bê navber berdewam dikin."

**'Dayîk ya ku filklor û kevneşopiyên civakê di parêze'**

Bêrîvan axaftina xwe wiha berdewam kir: "Dayîk ya ku filklor û kevneşopiyên civakê di parêze, li ser vê bingehê me xwest ku komeke xweser a dayîkan ava bikin. Di destpêkê de gelek astengî li pêş berî me derketin, ji ber ku gelek kesan digotin ku çawa ev dayîkên bi temen mezin wê di nava şahiyan de karê hunerî bike û bi taybet dayîkên Kurd. Lê bi serkeftina koma Şehîd Rîhan a Dayîkan ev atengî û zehmetî hatin şikandin. Herwiha bi demê re gel piştgirtiya vê komê kir û rojan e hejimara dayîkan zêde dibû."

**'Temenê dayîkan ji 30 heta 80 salî ne'**



Bêrîvan Elî da zanîn ku temenê dayîkên ku cihê xwe di nava Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan de digirin, ji 30 salî heta 80 salî ne û wiha pê de çû: "Di nava Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan de gelek dayîkên bi temen mezin hene. Herwiha ev dayîkên bi temen mezin parastina kevneşopiyên civaka xwe dikin. Ev kom li ser tabloya ku rengê kevneşopiya karê destan yên dayîkan dide nîşan, di heman demê de ev kom jî ji hemî civkan re dide nîşan dan ku hîn kevneşopiya dayîkên me zindî ye. Mîna amûra destar, teşî, bêjing û hwd…"
Rêvebera Navenda Çand û Huner a bajarê Amûdê Bêrîvan Elî axaftina xwe wiha bi dawî kir: " Di demên pêş de çi festîval û şahî werin lidarxistin, wê Koma Şehîd Rîhan a Dayîkan tevlî bibe. Herwiha ez bi hêvî me ku her kes xwedî li parastina kevneşopiya civaka xwe derkeve û bi taybet jin."

# Avabûn, armanc û xebata Kongreya Islama Demokratîk

**Kongreya Islama Demokratîk saziyeke olî ye ku kar û xebata xwe li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê dimeşîne. Endamê rêveberiya kongreyê Ebdulkerîm Saroxan da zanîn ku armanc ji avakirina kongreyê ew e ku qada olî were birêxistinkirin, civak li dijî Islama siyasî û radîkal derkeve.**

Hemza Sêvo/ Qamişlo

Avabûna Kongreya Islama Demokratîk yek ji saziyên olî û civakî ye ku bi destpêkirina Şoreşa Rojava re hatiye avakirin.
Rêxistbûna wê û xebata wê di çarçoveya mijarên ola Islamê de ye, ev sazî jî ji destpêka avabûna xwe ve xebatê li ser asta Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê de dide meşandin. Derbarê kar û xebata Kongreya Islama Demokratîk de endamê rêveberiya kongreyê Edilkerîm Saroxan ji rojnameya me re axivî.

### Avabûn û armanca Kongreya Islama Demokratîk

Ebdilkerîm Saroxan girêdayî avabûn û armanca kongreyê de wiha anî ziman: "Di destpêka Şoreşa Rojava de rêxistinkirina xebata olî çêbû, dema pêşî Yekîtiya Zaniyarên Islamî di sala 2013'an hat avakirin. Piştî çend salan ji kar û xebata olî, di sala 2018'an de ev yekîtî bû Kongreya Islama Demokratîk. Armanc ji damezrandina Kongreya Islama Demokratîk ew bû ku qada olî were birêxistinkirin, hem jî xetîb, mele, jin, oldar û lêkolînerên olî bibin xwedî tevgerek. Da ku bi riya vê rêxistinê ola Islamê ya durist nas bikin û ola serdema Pêxember Muhemd pêk bînin. Hem jî da ku civak li dijî Islama desthilat, siyasî û radîkal ya ku li ser wan tê meşandin, derkeve û xwe jê rizgar bike. Rêber Apo di bangeke xwe de xwest ku Kurd, Ereb û hemû gelên muslman bi hev re Isalama demokratîk bidin pêş da ku rastiya civakê were naskirin. Di encama vê bangê de Kongreya Islama Demokratîk hat avkaiirin. Kongreya Islama Demokratîk têkilyên berfireh li ser asta cîhanî dide meşandin. Li hêleke din em têklî û xebatê bi rêxistinên Islama demokratîk ên Bakur, Rojihlat û Başûrê Kurdistanê re pêk tînin. Herwiha em danûstandinê bi Meclisa Civaka Demokratîk a Kurdên Ewropayê dikin, hem jî bi rêxistinên Isalîm yên Lubnanê û Maseya Navnetewî ya Amerîkî re çêdikin."

### Awayê kar û xebatê

Saroxan têkildarî kar û xebata Kongreya Islama Demokratîk de wiha domand: "Wekî tê zanîn di sîstema Rêveberiya Xweser de Meclisa Ol û Baweriyan de hemû ol û baweriyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dihewînin, heye, Xirstiyan, Êzdî û hwd… nûnera hemû mislmanên herêmê ola Isalamî jî Kongreya Islama Demokratîk e. Navenda Kongreya Islama Demokratîk li Qamişlo ye, li kanton, bajar û navçeyan meclisên me hene, herwiha xebat bi rengekî nenavendî tê meşandin. Bêtirî 5 hezar mele û zêdeyî 3 hezar û 300 camî hene, em xudibeyên roja înê didin melayên hemû camiyan da ku Îslama rast ya serdema Pêxember Muhemed bi rengekî nûjen were naskirin. Xudbeyên dema kilasîk ji bo mizgeftan ên bi rêbazên Islama radîkal û siyasî nema li mizgeftan tên dayîn, li şûna wan Islama demokratîk dikeve dilê civakê. Di heman demê de perwereyên girêdayî Islama pak û resen ên dûrî Islama siyasî û radîkal ji bo mele û xetîban tên dayîn, ev perwerde bi şêweyekî domdar, rojane û heftane tên dayîn. Li aliyekî din konferans û semîner girêdayî mijarên cuda yên girêdayî olê tên lidarsitin. Herwiha naveneke lêkolînan heye, xudbe li gorî hewcedariyê civakê tên nivîsandin û lêkolînên girêdayî mijarên olî tên amadekirin. Herwiha rêbazên perwerdeya olî ji bo dibistanan li gorî perensîbên civakê tên sazkirin, li alyê din peymangeh, beş û dibistanên olî di bin siya Kongreya Islama Demokratîk de ne."

### Jin di Kongreya Islama Demokratîk de

Ebdilkerîm derbarê rola jinê di kongreyê de wiha anî ser ziman: "Weke tê zanîn ku li tevahiya Sûriyê xetîbên jin tune ne, piranî xetîb û



mela ne, ji ber vê yekê jî asta xebata jinan di Kongreya Islama Demokratîk de kêmtir e ji xebata mêran. Di nav kar û xebatê de rêjeya jinan ji sedî 35 e. Xebata jinê tenê di warê dayîna korsên fêrkirina Quraana pîroz de ye, bi taybet di bêhinvedana dibistanan de li mizgeftan tên dayîn. Li aliyekî din Kongreya Islama demokratîk di nav lêkolîn, xudbe û hwd… de balê dikişîne ser mafê jinan, mijara sernixumandinê, berdana jinan û gelek mijarên din yên girêdayî jinan."

### Guhertina ku bi xwe re anî

Saroxan derbarê guhertina ku kongreyê pêk aniye wiha got: "Kongreya Islama Demokratîk xwe li ser sê stûnan di warê rêxistinî de ava kiriye, yê yekem meclisên barja û kantonan e, ya duyem Kombenda Al Elbeyt e û ya sêyem Meclisa Jin ya girêdayî Kongreya Islama Demokratîk e. Em li ser van stûnan xwe bi rêxistin dikin û xebatê didomînin. Herwiha li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê nêzî 400 endamên Kongreya Islama Demokratîk hen. Kongreya Islama Demokratîk têkokşîneke gelekî mezin daye meşandin, eger em bipişopînin dê bibînin ku guhertin di warê ola Isalamê de çêbûye. Hem jî Kongreya Islama Demokratîk mîna QSD, MSD û Rêveberiya Xweser xwedî bandoreke mezin bû li ser gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û dibe stûneke bingehîn."

### Astengiyên ku derdikevin pêşiya wê

Endamê rêveberiya Kongreya Islama Demokratîk Ebdilkerîm Saroxan girêdayî astengiyên ku derdikevin pêşiya kongreyê wiha qedand: "Hişmendiya paşverû ya Islamê dibe kelemeke mezin li pêşiya kar û xebata me. xetîb, oldar û piraniya civaka me bi Islama paşverû ya radîkal ve hatine girêdan bêyî ku di aliyê fikr de lê binerin. Li hêleke din ji ber mijara DAIŞ'ê Islam li pêşiya çavên tevahiya duniyê reş kiriye. Ev Islama cîhadîst û pevgirêdana wan bi hev re dibe astengiyeke herî mezin li pêş me. Em bi riya perwerde û korsan civakê fêr dikin da ku Islama baş û guncav bikin. Em nikarin bêjin ji sedî sed ku armanca me giha serî, lê belê ji 50 ji sedî guhertin bi erênî çêkiriye."

# Kar û xebatên Şaredariya Gel a bajarê Amûdê

Diyala Nîdal\Qamişlo

**Şaredariya Gel a bajarê Amûdê ji bo xizmeta welatiyên bajarê û gundewarê wê, herwiha ji bo parastina jîngehê gelek kar û xebatan dide meşandin. Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Amûdê Mihmed Elemarî diyar kir ku ew ji bo xizmeta gel û parastina jîngehê her dem di nava xebatê de ne.**

Li Rojavayê Kurdistanê piştî Şoreşa 19'ê Tîrmehê û damezrandina Rêveberiya Xweser, herwiha xebatên şaredariyê yek ji lingên bingehîn yên sîstema Rêveberiya Xweser e jî, roj bi roj pêş dikevin.
Şaredariya Gel a bajarê Amûdê di havîna sala 2013`an de hat damezrandin. Ji wê demê û heta niha, şaredariyê xebatên rêvebirin û pêşkêşkirina xizmetguzariyên civakê yên weke ekolojî, paqijî, sîstema riyên bajar û gundewarên wê û gelek karên din bênavber dide meşandin. Di derbarê xebat û pirojeyên Şaredariya Gel a bajarê Amûdê de, hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Amûdê Mihmed Elemarî ji Rojnameya me re axivî.



### 'Em ji bo xizmeta gel û parastina jîngehê her dem di nava xebatê de ne'

Mihmed Elemarî anî ziman ku ew ji bo xizmeta gel û parastina jîngehê her dem di nava xebatê de ne û wiha got: "Kar û xebatên şaredariya bajarê Amûdê bi aweyekî bi rêxistinkirî tên meşandin. Herwiha gelek beşên şaredariyê hene, mîna beşê beravê, agir kûjê, cenetoran, temûnê, avê, têkilî, paqijî û hwd… Di heman demê de, her beşekî şaredariyê sîstem û zagonên wê hene. Lê ya herî girîng biryara me ya şaredariya ye, ya ku di sala 2024'an derket, ev biryar jî di aliyê zagon, erkê şaredariyê û yekîtiya şaredariyan de dide xuyakirin."

### 'Li bajarê Amûdê 36 mecilsên şaredariyê hene'

Elemarî axaftina xwe wiha berdewam kir: "Her şardariyeke di hundirê erdinîgariya xwe de ye, herwiha hejimara mecilsên şaredariyan ne diyar in. Her bajarek li gorî hejimara welatiyê wê, li ser vê bingehê hejimara mecilsên şaredariyê tên xuyakirin. Helbet ev yek jî bi hemhengiya desteya bilind a hilbijartinan tên kirin. Li bajarê Amûdê 36 mecilsên şaredariyê hene, bêguman pêwîstbû ku piştî biryara şaredariyan hilbijartinên mecilsan hatibane kirin. Lê ji ber rewşa herêmê hilbijartin ne hatin kirin."

### 'Hejimara endamên şaredariya bajarê Amûdê 26 in'

Mihmed Elhemarî da zanîn ku hejimara endamên şaredariya bajarê Amûdê 26 in û wiha pê de çû: "Hejimara endamên me 26 in û em mihê carekê civînên xwe çêdikin. Herwiha di wan civînan de, em li ser kar û xebatên şaredariyê bi giştî nîqaş dikin. Di heman demê de, biryarên projeyên salan e tên nîqaşkirin. Lê ev yek piştî ku em civînên xwe bi komînan re çêdikin û nêrînên wan digirin. Li ser vî bingehî em pirojeyên xwe radikin yekîtiya şaredariyan, herwiha yekîtiya şaredariyan radike li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê."
Her şaredariyeke zagoneke wê ya demokratî heye, ev zagon jî bingehê wê beşdarbûna milet di biryaran de ye. Ji ber vê yek milet nûrên xwe derdixin û ev nûner bi riya mecilsên şaredariyê re biryaran digirin. Lê karê me zêdetir girêdayî komînana ne, li ser vî bingehî em kar û xebatên xwe didin meşandin.

### Projeyên şaredariya bajarê Amûdê

Mihmed Elhemarî di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Li gorî derfetên Rêveberiya Xweser em kar û xebatên xwe didin meşandin. Îsal weke şaredariya bajarê Amûdê pênc projeyên me hebûn, mîna projeya kenalên ava qirêjiyê, kolana bîra deryayî, da ku ava bajarê Amûdê xurt bibe, Herwiha projeya ziftkirina riyên sînaha, projeya çaremîn jî zêftkirina hin riyên Amûdê. Di heman demê de, projeya pêncemîn çêkirina kenalên ava baranê bû. Ji bo projyên 2026'an me du civîn çêkirin, di van civînan de jî li ser kar û xebatên şaredariyê tên nîqaşkirin. Herwiha pêşinyarên pirojeyên 2026'an jî hatin nîqaşkirin, ev pêşinyar jî yek li ser ziftkirina riyên bajarê Amûdê bû. Di heman wextî de jî li ser çêkirina parke giştî ji bo bajarê Amûdê nîqaş hatin kirin. Projeyên strajîk yên ku di bajarê Amûdê de hatine çêkirin riya sînaha bi dawî bûye, ya din jî çêkirina bazar har bû. Ji ber ku li nêzî wê bazarê gelek mal hebûn, ji ber vê yekê em weke şaredarya bajarê Amûdê pêwîsî dît ku bazareke nû çêkin."

Hevserokê Şaredariya Gel a bajarê Amûdê Mihmed Elhemarî axaftina xw wiha bi dawî kir: "Ji bilî pirojeyên salê, em kar û xebatên xwe weke şaredariya bajarê Amûdê didin meşandin, mîna sererastkirina cihan, sererastkirina kolanan hwd… ev yek jî ji bi riya sindûqa şaredariyê tê kirin. Ez bi hêvî me ku gel bi me re alîkar be, ji ber ku xizmeta bajarê û parastina jîngehê erkê her kesî ye."



# 'Bikarhênerên madeyên hişbir sûcên cînayetê jî dikin'

**Li kantona Cizîrê ji destpêka salê ve hezar û 348 kes ji ber mijarên madeyên hişbir hatine girtin, rêveberê Hêzên Dijî Madeyên Hişbir Esed Hesen Resûl diyar kir ku ji ber armanên dijmin bi şerê leşkerî pêk nehat berê xwe da şerê taybet û got, "Bikarhênerên madeyên hişbir sûcên cînayetê jî dikin."**

Ronahî Sadûn/Qamişlo

Yek ji polîtîkayên herî qirêj ku ji aliyê dijmin ve li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê meşandin, şerê taybet û şandina madeyên hişbir. Dewletên desthilatdar ne tenê bi rêya leşkerî erişî gel dikin, lê dixwazin hemû cûreyên şerê taybet li ser gel bidin meşandin û tirsê bidin avakirin. Bi taybetî jî cihê ku ji aliyê dewleta Tirk ve hatiye dagirkirin niha bûye cihê bazirganiya madeyên hişbir û ji wan herêman madeyên hişbir dişînin herêmên din ên biewle, ev yekser bi destên dewleta Tirk tên kirin. Herwiha ji ber jin û ciwan pêşengên civakê ne, lewma desthilatdar gava xwe ya yekem jin û ciwanan dikin armanc û madeyên hişbir belav dikin. Madeyên hişbir û fihûş civakê ji hundir ve dirizînin.

### Madeyên hişbir xeteriyên mezin bixwe re tînin

Xeteriyeke mezin a madeyên hişbir li ser gel heye. Mirovên van madeyan bi kar tînin, dibin xeteriyên mezin ji xwe û derdorê xwe re jî. Kesên ku wan madeyan bi kar tînin tenê ji bo ku xwe bighînin van madeyan carnan digihêjin asta ku kesê li dora xwe bikujin. Diyardeya bikaranîna madeyên hişbir yek ji wan kêşeyên giran e ku takekes yan civak tûşî wê yekê dibe, ji ber ku ziyanên bikaranîna madeyên hişbir ne tenê bandorê li kesên bi kar tînin dike, belkî bandorên wê digihêjin ziyanên civakî û aborî jî. Bikaranîna madeyên hişbir ango narkotîkê dibe sedema nexweşiyên dil û tansiyona bilind û carnan dibe



sedema teqîna damaran. Ger beden ji nişka dev ji bikaranîna narkotîkê berde, rûbirûbûna girtina serpêbûnê, enfeksiyona mêjî ku dibe sedema halusînasyonan û carnan jî windakirina bîrê bi xwe re tîne. Bi kurtasî gelek bandorên din ên ku xeteriyên mezin bi xwe re tîne hene.

### Li gorî pêvajoyê operasyonên berfireh pêk tên

Hêzên Dijî Madeyên Hişbir 4 sal hatiye damezrandin û şaxên wê li hemû Kantona Cizîrê hene, ew li gorî demê û pêvajoyê bi erkên xwe radibin û operasyonên berfireh ji bo tunekirin û kontrolkirina madeyên hişbir didin destpêkirin. Ji destpêka salê û heya niha ji aliyê Hêzên Dijî Madeyên Hişbir ên Kantona Cizîrê ve 943 hejmara dosya, hezar û 348 kes, Hebên Kabtîkolê 3 milyon 39 hezar û 940, Heşîş 73 kîlo û 555 g, Kirîstal 4 kîlo û 533g di operasyon, navendên kontirolê û hwd…hatine girtin. Ev madeyên herî zêde en li kantona Cizîrê berbelav in.
Derbarê şerê taybet û madeyên hişbir, Rêveberê Hêzên Dijî Madeyên Hişbir Esed Hesen Resûl ji Rojnameya me re axivî.

### 'Rê û rêbazên şerê taybet tên meşandin'

Esed Resûl diyar kir ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybet kantona Cizîrê bi gelek rê û rêbazan şerê taybet tê meşandin û wiha got: "Ji ber herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi şoreşa Rojava re gelek destkeftî bidest xistine, aramî û ewlebûna herêmê pêk aniye. Lewma ji aliyê dijmin ve li ser vê herêmê gelek rê û rêbazên şerê taybet tê meşandin, yek ji wan rêbazan jî derbaskirina madeyên hişbir ji herêmê re, da ku bi rêya wê destkeftî û aramiya herêmê tê bibe. Ji bo wê yekser jin û ciwanan dike armanc, ji ber avabûna û pêşxistina civakê bi destê wan e."

### 'Bi şerê leşkerî armancên dijmin pêk nehat, şerê taybet da destpêkirin'

Resûl eşkere kir ku ji ber armancên dijmin bi derbaskirina çeteyên DAIŞ'ê û dagirkirina hin bajarên me neçû serî, êdî şerê taybet da meşandin û wiha pê de çû: "Dewleta Tirk û gelek hêzên din ên ku li dijî herêmê kar dikin ji ber armancên wan bi derbaskirina çeteyên DAIŞ'ê û dagirkirin hin bajarên me neçû serî bi taybet armancên dewleta Tirk. Ji ber li hemberî xwe hêzêke xurt û birêxistinkirî dîtin, lewma li dijî herêmê dest bi şerekî taybet kirin. Şerê taybet jî ji şerê leşkerî xetertire ku li ser mirov dide meşandin beyî ku mirov di ferqa wê de be. Li herêmên dagirkirî mîna Serêkaniyê madeyên hişbir hatin çandin ji aliyê dewlet Tirk û çeteyên wê ve, da ku ji wan herêma derbasî herêmên me bikin. Di heman demê de gelek sîxorên xwe li dijî herêmê bikar anîn û xwest bi rêya wan hemû xerabiyan pêk bînin."

### 'Di nava salekê de hejmareke zêde ji madeyên hişbir hatine desteserkirin'

Esed Resûl anî ziman ku ew bi erkên xwe radibin û operasyonên berfireh ji bo tunekirin û kontrolkirina madeyên hişbir didin destpêkirin û wiha domand: "Li Kantona Cizîrê di nava salekê de me hejmareke zêde ji toreyên madeyên hişbir girtin. Di heman demê de em gelek operasyonan pêk tînin, da ku rê li hemberî vê yekê bigirin. Bajarên ku herî zêde li Kantona Cizîrê madeyên hişbir lê têne girtin jî weke Qamişlo û Hesekê ye, ew jî ji ber lingên nenas derbasî wê dibin, hem jî ji aliyê Reqa û Dêrazorê madeyên hişbir derbasî alanên me dibin, destê dewleta Tirk jî di vê yekê de heye ku ew li pişt vê yekê disekine. Ji bo em rê li hemberî vê yekê bigirin, xetên me yên gerim ku 24 seatan li ser karin hene, ew jî veşartineke xwe heye, li kêleka wê em pêngavên hişyariyê li dibistan, komîn, tax, bajar û hwd… pêk tînin, hem jî biroşûran belav dikin. Lê ereka sereke li ser milê malbatê ye."

### 'Kesên madeyên hişbir bikar tînin sûcan pêk tînin'

Esed Resûl diyar ku kontirola wan li ser rêyên ku madeyên hişbir tê re derbas dibin hene û hin rê jî hîna nehatine eşkerekirin û wiha got: "Ji bo derbaskirina madeyên hişbir li herêmê rêyên wan hene ku ji wan nêzî 4 rê em li ser kontirolê dikin, lê hin rê hene hîna şopandina me ji bo wan heye, ji ber heya niha nehatine eşkerekirin. Sûcên cînayetê ji kesên ku madeyên hişbir bikartînim çêdibin ku ew kes dikare kuştin, dizî û tundiyê li malbatê bike û hem jî destdirêjî jî pêk bîne. Hemû sûc bi rêya madeyên hişbir pêk tê. Kar û xebatên me jî li dijî madeyên hişbir bi rengekî qanûnî di rêya dozgeriya giştî re tê kirin ku her tişt fermiyeta wê heye. Herwiha 3 bendên madeyên hişbir hene ji wan bikaranîn, belavkirin û bazriganî, girtiyên van her bendan jî diçin dozgeriya giştî ango li dadgehê têne cezakirin."

### 'Bi hemû hewldanên xwe em ê madeyên hişbir li herêmê nehêlin'

Esed Resûl axaftina xwe wiha qedand: "Em bang li gelê xwe dikin ku bi me re alîkar bin, dema ew gûmanê li ser kesnan bikin me agahdar bikin. Di heman demê de hêviya me ji ciwanên me ew e ku ew dûrî madeyên hişbir biçin û jiyana xwe nexin nava metirsiyê de. Herwiha em jî soz bi gelê xwe re didin ku em ê bi hemû hewldanên xwe madeyên hişbir li herêmê nehêlin."

# 'Êriş bêbersiv namînin, bersiva wan jî wê xurt be'

Ronaz Silêman/Qamişlo

**Rêveberiya Meclisa Leşkerî ya Kantona Firatê Mihemed Mistefa Elî diyar ku li hemberî êrişên berdewam ên li ser herêmê QSD'ê xwedî bersiva xurt e, heya niha jî DAIŞ xwe zindî dike, ji bo wê girîngiya Sûriyê û giştî cîhanê bi QSD'ê heye û got, "Dema QSD'ê çek rakir armanca wê parastin û aramiya gel bû."**

Bi dirêjahiya şoreşê, avakirina Rêveberiya Xweser û hêza QSD'ê re êrişên bi plan li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên kirin. Ev êriş armanca wan jî diyar e ku dixwaze ev rêveberî û hêza leşkerî têk biçe, aramî li herêmê nemîne û dagirkerî berfireh bibe. Lê li hemberî wan bersivên xurt ên hêza QSD'ê tên dayîn.
Derbarê êrişên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybet aliyên Dêra Zorê û



Dêr Hafirê, rêveberiya Meclisa Leşkerî ya Kantona Firatê Mihemed Mistefa Elî ji Rojnameya me re axivî.

### 'QSD'ê hêza sereke li hemberî DAIŞ'ê ye'

Mihemed di destpêka axaftina xwe de wiha got: "Hêza sereke ku şerê çeteyên DAIŞ'ê kir û heya roj îro jî dike QSD'ê ye. Yên ku dibêjin me şerê van çeteyan kir ne rast e, ji ber cîhan hemû jî bi çavên xwe dît û bûn şahidê wê, dema ku QSD'ê şerê DAIŞ'ê dikir tu hêz tunebû şerê wê bike, tenê hêzên cîhanî weke Koalîsyona Navdewletî bi şerê li hemberî DAIŞ'ê bi me re bûn. Di heman demê de di hemû pêngavên li dijî DAIŞ'ê em û hêzên Koalîsyonê bi hev re dikin."

### 'Hikumeta veguhêz dixwaze sûcên xwe binixumîne'

Mihemed anî ziman ku bi nav komên çete di bin serweriya hikumeta Sûriyê de ne, lê ew girêdayî dewleta Tirk in û wiha got: "Rast e hikumeta Sûriyê li ser ragihandinê tê gotin ku giştî girêdayî wîzareta parastinê ye, lê li ser erdê her aliyek serbixwe ye. Heya niha çeteyên girêdayî Tirkiyê ku tên naskirin bi Sultan Murad, Silêman Şah, Hemzat, Emşat û hwd… her yek ji wan bi serê xwe êrişan pêk tîne û gel armanc dike. Beriya çend rojan jî li aliyê Dêr Hafirê êriş li ser sivîlan çê bû ku di encamê de hin sivîl şehîd bûn û hin jî bi giranî birîndar bûn. Lê hikumeta veguhêz ji bo xwe ji van êriş û komkujiyan dûr bixe, QSD'ê tewambar dike. Herwiha Dewleta Tirk naxwaze hêzeke birêxistinkirî li hemberî êrişên wê bisekine, lewam êrişên wê li her hêz û herêma me nayên rawestandin."

### 'Li hemberî her êrişekê wê bersivek xurt bê dayîn'

Mihemed wiha pê de çû: "QSD'ê li hemberî her êrişekî bêdeng namîne û xwedî bersive, besiva wê jî xurt e û armanca wê parastina gel e. Ji ber dema QSD'ê çek rakir armanca wê ya sereke parastin û aramiya gel bû. Tu carî me şerê tu kesî nekiriye lê dema êrişî me bikin, em jêr amade ne û em xwedî bersiv in. Her diçe jî hêza me xurt dibe, gavên me her dem bi pêş de ne û tu carî em bi paş de naçin. Armanca me ne ku em herin alan an jî deverên din bigirin û bixin bin serweriya xwe, armana me tenê ew e ku parastina gel û herêma xwe bikin."

### 'QSD'ê ne hêzeke normal e, hêza birêxistinkirî ye'

Mihemed Mistefa Elî axaftina xwe wiha qedand: "Piştî dayîna bi hezaran ji bedêlên giranbuha em çekê xwe bernadin û ne çekan datînin. Em ê parastina gelê xwe bikin heya ku lihevkirineke pêk bê li ser bingehê nenavendîbûnê û misogerkirina siberojeke azad a gelan. QSD'ê ne hêzeke normale lê hêzeke birêxistinkirî û xwedî tucûrbeyên bi dehê salan e. Heya niha DAIŞ xwe birêxistin û zindî dike, hêza li hemberî wê şer dike jî QSD'ê ye ji bo wê girîngiya Sûriyê û giştî cîhanê bi QSD'ê heye."

# Bandora şer li ser mirov û jiyanê... (2)

Di şerê Efxanistan û Îraqê de her çiqasî lîstikvan an jî rêbaz hatibin guhertin, lê belê di cewhera xwe de proje û armanc yek bûn ew jî şerê desthilatdariyê û berjewendiyan bû. Lê yên ku herî zêde ziyan dîtin sivîl bûn, bi taybet jin û zarok bûn qurban.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Şerê Efganistanê
Wekî bertekeke rasterast a li hemberî êrişên 11`ê Îlonê ku Rêxistina Al-Qayide bi serokatiya Ûsama Bin Ladin ya li dijî Amrîkayê, di sala 2001'an de Amêrka û hevalbndên xwe êrişî Efxanistanê Kirin û di encamê de hikumeta Talîbanê ya îslamî hilweşiya.

Şerê Afganistanê, ku zêdetirî 20 salan dom kir, di dîroka hemdem de serdemeke girîng e. Di nav salan de gelek bûyerên girîng di şer de qewimîn. Ew çîrokeke êş û lêgerîna ewlehiyê ye. Di nava wan salan de çiqas hewldanên başkirina rewşa jiyanî hatin kirin, lê ji ber dewama êrişên di navbera Talîban û Amrîkayê de rewşa ewlehiyê xerab bû. Vê rewşê dewam kir heta derketina Amrîka ji Afxanistanê.

Encama şer bi girîngî guherî dema ku Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di sala 2021`an de hêzên xwe vekişand, her çend Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê armancên xwe yên destpêkê bi dest xistibûn jî. Di dawiyê de, şer polîtîka cîhanê guherand û Afganistanê bi awayekî kûr baca şer dan.

### Rewşa Jinên Efgan di vavbera salên 1996 û 2001'an de

Dema Talîbanê di sala 1996 û heta 2001`an desthilata Efganistanê desteser kir, jinên Efgan ji perwerdeyê, xebatên siyasî, kar û derketina ji malê - ji bilî ku mêrek pê re hebe- hatin mehrûmkirin û lixwekirina destmalê, zewicandina bi darê zorê, kuştina bi keviran (recimkirin) û kiryarên din ên dermirovî, li ser jinan hatibûn ferzkirin.

Li herêmên di bin serweriya Talîbanê de, binpêkirinên li dijî jinan ranewstiyan, her wiha li herêmên berê ên di bin desthilata Talîbanê de jî li dijî jinan sûcên binpêkirinê pêk anîn. Li gorî raporan, yek ji jinên Efgan ku hemû kurên wê bi destê endamên Talîbanê hatin qetilkirin, dibêje ku Talîbanê hevjînên kurên wê neçarî zewicandina bi endamên xwe re kirine, her wiha keçeke wê ji malê revandine.

### Serdemeke din ji tarîtiyê li benda jinên Efgan e

Piştî ku tevgera Talîban Efganistan desteser kir, careke din çarenûsa jinên Efgan bi tarîtiyê re rû bi rû ye. Ruxmî ku tevgerê soza guhertina zihniyeta xwe li hemberî jinan dabû, lê tu hêvî li asoyan xuya nakin. Şopînerên rewşê dibêjin ku yekane rêya rizgariya jinên Efgan têkoşîn e.

Ji 15`ê Tebaxa 2021'an ve piştî derketina serokê Efganistanê Eşref Xenî ji welêt û desteserkirina Talîbanê li ser hikumê Efganistanê, carek din çarenûsa jinên Efgan ne zelal e. Gelek derdor li ser pêşeroja jinan li Efganistanê di bin siya Talîban de metirsîdar in. Çavdêr dibêjin ku jin qurbaniyên bûyerên li Efganistanê ne.

Tevgera Talîban got ew ê qanûnan derxe da ku beşdariya jinan di qadên jiyanê de misoger bike. Berdevkê Talîbanê Zebîhallah Mucahid jî raporên têkildarî zewcandina jinan bi darê zorê, derewandin. Berdevkê Talîbanê got, "Talîban plan nake ku tecrîdê li ser jinan ferz bike, ew ê bihêle ku beşdarî perwerdeyê û kar bibin, lê belê divê destmala serî li xwe bikin."

Gelek raporan eşkere kir ku endamên Talîban diçin malên welatiyan û lîsteyan bi hejmarên jin û keçên di navbera 12 û 45 saliyê de amade dikin, da ku wan bi darê zorê bi endamên tevgerê re bidin zewicandin. Di heman demê de Talîbanê qedexe kiriye ku jin bêyî mêran ji malên xwe derkevin. Di raporan de her wiha tê destnîşankirin ku jin êdî nikarin kar bikin, bixwînin an jî cilên dixwazin bi serbestî li xwe bikin û gotin ku dibinstan jî hatine girtin.

### Şerê Îraqê 2003



Di sala 2003`an de cîhana siyasî ji ber şerê Îraqê zêde hat guhertin. Di 20`ê Adarê 2003`an de Dewletên Yekbûyî û koalîsyona wê dest bi şerê Îraqê kirin. Ev şer tenê 3 hefteyan dirêjkir û rêjîma Sedam Huseyîn hate ruxandin. Sedemê şer ew bû ku Sedam Huseyin "çekên kimyewî û atomî" hebû û ev jî ji bo cîhanê metirsî bû. Lê hin raporên din diyar dikin ku sedema şerê Îraqê ew bû ku sedema sereke kontrola neftê Îraqê, di heman demê de ku Amerîkayê di Rojhilata Navîn de bibe xwedî serweriyeke mezin. Bi qasî ku rejîm li Îraqê hate ruxandin jî, ewlehî û siyaseta nû nehat ava kirin.

### Piştî şerê Iraqê

Di sala 2003'an de, piştî ku koalîsyona navneteweyî bi serdariya Dewletên Yekbûyî (Amerîka) dest bi şer kir û rejîma Saddam Hussein derxist, Iraq û hemû Rojhilata Navîn têkevin serdema nû yê siyasî û civakî. Ev şer tenê desthilata Saddamê xilas nekir, lê di hemû herêmê de desthilat û dengaziyê nû çêkir. Desthilata Saddam Hussein bi dawî bû, lê Iraq têk çû nav xeyraneke mezin. Şerên navxweyî, teqezayên sekterî (Şîî û Sûnî) û hêzên terorîstî wekî Al-Qaîda û piştî wî Daîş (ISIS) derketin holê. Iraq bû qada giranî ya şer û terorîzmê. Iran bi taybetî di Iraq û Sûriyê de rolê girîngtir girt. Teşeyûa Şîî li Iraq hêz û desthilat wergirt, û ew rol ji bo siyaseta Tehranan pir bandorî bû. Tirkiyê di nav herêmê de bi şerê li dijî PKK û jî bi operasyonên xwe li Iraq û Sûriyê rol xwe fireh kir. Tirkiyê jî di siyaseta Sûriyê û Iraqê de xebatên stratejî bû.Piştî 2003-an, Kurdistanê Iraq hêza xwe siyasî û aborî zêde kir û bû yek ji parêzgehên herî ewleh ya herêmê. Di Sûriyê jî, li şaxên Rojava hêzên kurd kontrol û xweserî avakirin. Qirkirina Iraq, komkujiya gel, û dagirkirina ji aliyê koalîsyona Amerîkayê, dest bi derketina Daîş kir. Di sala 2014-an de Daîş giranî xwe zêde kir û gelek bajarên Iraq û Sûriyê dagir kir. Li hemû Rojhilata Navîn şer û dagirkerîyên piştî 2003-an sebeb bûn ku milyonên mirovên sivîl ji mala xwe derkevin û di herêm û derveyî herêmê de bixin penaber.

### Pêşveçûna rêxistinên terorîstî

Al-Qaîda li Iraq, Di sala 2004`an de, Ebu Musab al-Zarqawi Al-Qaîda li Iraq hat damezrandin. Ew di destpêkê de bi şerên bomblê û xebatên intiharî nav Iraqê lêkolîn kir. Di sala 2014`an de DAIŞ hat derxistin; Piştî ku Zarqawi hat kuştin, rêxistina wî bi navên cuda berdewam bû heta ku di 2013–2014-an de bû Dawletê Îslamî ya Iraq û Şam hat damezrandin. Ew kom piranî li Iraq û Sûriyê de belav bû, wan derfetên valatiyê dîtin ku hikumetek wiha li ser wan control bike tune bû, bi armanca fikir û îdeolojiya îslamiyetê di nava civakê de bidin çandin, lê ev kom jî her bi tundî, serjêkjirin, revandin û firotina jinan, komkujî û kuştin li ser gel pêk anî.

### Çawa şerê li Sûriyê dest pê kir?

Destpêka 2011`an de, li beramberî "Bahara Erebî" de, gund û bajarên Sûriyê gel serhildanên xwe li dijî rejîma Beşar El-Assed dan destpê kirin. ew serhildan jî bi armanca ku jiyanekî demokratîk û azadî li Sûriyê were dîtin. Lê her ku çû şer û pevçûn li Sûriyê jî berfereh bû, di heman demê de gelek komên çete derbasî Sûrî bûn û tevlîheviyekî mezin dan avakirin. Koma herî xeter jî dihat nasîn, çeteên DAIŞ`ê bû, lê bi derketina Yekîneyên Parastina Jin (YPJ), Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) û bi saya wan ku di roja îro de çeteyên DAIŞ hatin tune kirin. bê guman şerê li Sûriyê hat qewmandin, şerê herî mezin û dirêj li Rojhilata Navîn da rû da.





## Hikumeta HTŞ'ê dixwaze peymana 10'ê Adarê têk bibe

**Dilyar Cizîrî**

Di roja 10'ê Adarê de di navbera fermandarê Giştî yê QSD'ê Mazlûm Ebdê û Serokê hikumeta Veguhêz ê Sûriyê Ehmed El Şeri de peyman hate imzekirin. Di peymanê de 8 xal hatibûn bi cihkirin. Yên herî giring rawestandina şer li tevahî xaka Sûriyê, vegera koçberan a bi ewle, bi cihkirina mafê gelê kurd di destûra Sûriyê de û entegresyona Rêveberiya Xweser bi saziyên xwe yên leşkerî û sivîl di nava saziyên hikûmeta Sûriyê de, herwiha parastina mafê hemû pêkhateyên Sûriyê ne. Ji bo pêkanîna xalên peymanê komîteyên taybet werin avakirin û divyabû heta dawiya salê ev xal werin bi cihkirin.
Hikûmeta HTŞ'ê bêyî guh li xalên peymanê bide, bi tena serê xwe destûreke nû ya xwe dispêre zihniyeta rêjîma berê derxist. Niha jî amadekariya lidarxistina hilbijartinên "meclisa gel" dike. Bêyî guh li aliyên din bike, hesabê tevgerên civakî û partiyên siyasî yên Sûriyeyê ne kir û namzetan diyar dikin. Tişta sosret jî ew e serokê veguhêz Ehmed El Şeri ji 3 paran parekî endamên meclisê erkdar bike. Yên din jî wê ji aliyê wan ve werin bi cihkirin.
Di vê dema derbasbûyî de çend caran çekdarên hikûmeta HTŞ'ê li Dêrhafir, Dêrazor û Helebê êrişî navendên QSD'ê û hêzên ewlekariya hindir kirin. Piştgiriya tevgera DAIŞ'ê dikin û herî dawî jî duh çekdarên girêdayî hikûmeta HTŞ'ê êrişî bendên kontirolê yên hêzên ewlekariya hindir ên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê kirin. Hêzên ewlekariya hindir ên li gorî itîfaqa di navbera Meclisa Rêveberiya xweser a taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û hikûmeta HTŞ'ê de, parastina herdû taxan dikirin, bersiv dan û çekdarek kuştin û 3 birîndar kirin.
Cenazeyê kuştî û birîndarên HTŞ'ê ketin destê hêzên ewlekariya hindir ên Şêxmeqsûd. Ragihandina hikûmeta HTŞ'ê îda dike "hêzên taxa Şêxmeqsûd êriş pêk anîne". Heger êriş ji aliyê Şêxmeqûs û Eşrefiyê de pêk hatiba, cenaze û birîndarên çekdarên HTŞ'ê li hindirê taxê çi dikin. Ya din balafireke wan a bê mirov ji aliyê endamên hêzên ewlekariya herdû taxan ve hate xistin.
Di hemû wextî de rewşa li Helebê Serokê Hikûmeta HTŞ'ê Ehmed El Şeri bi daxuyaniyên xwe ev çend car in îda dike ku QSD'ê li gorî peymana 10'ê Adarê tevnegeriyaye û dibêje heta meha 12'an heger pêk neyê peyman têk diçe. Ji daxuyaniyên El Şeri yên piştî hevdîtinên wî û rayedarên wî yên bi berpirsên dewleta Tirk re pêk hatin, diyar dibe ew dixwazin peymana 10'ê Adarê têk bibin. Hesabên wan û dewleta Tirk yekin, ji ber vê jî proveqesyonan dikin. Geh bi navê eşîran û geh bi navên cûda hewl didin ji raya giştî re diyar bikin ku QSD'ê êriş dike û peyman têk biriye.
Herî dawî Ebû Mihemed El Colanî (Ehmed El Şeri) ê niha di hevpeyvîneke xwe ya ragihandinê de li ser QSD'ê gotina "Rêxisgtina QSD'ê" bi kar anî. Bi vê jî xîtabî dewleta Tirk dike û dibêje wan va ez li gotî we tevdigerim. Ji van geşedanan baş diyar dibe ê hikûmeta HTŞ'ê bi rêve dibe dewleta Trik e, ji lewma ihtîmala şerekî mezin di demên pêş de heye.



# 'Girêdayî têkiliyên Rêveberiya Xweser û Lubnanê danûstandin berdewam in'

Nûnerê Rêveberiya Xweser li Lubnanê Ebdulselam Ehmed da zanîn ku peywendiya bi partî û hikumeta Lubnanê re, peywendiyeke danûstandin û diyalogê ye û got, "Her çend bi fermî piştgirîya wê nake jî, lê ew baş dizane ku ev proje li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûye rastiyek û roleke wê ya girîng di parastina aramiyê û şerê li dijî terorê heye".

**Zana Roj/Qamişlo**

Têkildarî xebat û têkiliyên Rêvebriay Xweser li Lubnanê bi giştî û bi taybet jî li gel hikumetê. Nûnerê Rêveberiya Xweser li Lubnanê Ebdulselam Ehmed bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû.

**Gelo Rêveberiya Xweser li Lubnanê di kîjan çarçoveyê de xebatê xwe dide meşandin, her wiha bi sazî û tevgerên Rêvberiyê li wir re têkiliyek çawa heye?**

Rêveberiya xweser li Lubnanê di çarçoveyek fermî an yasayî ya rasterast de kar nake, ji ber ku Lubnan dewletek serwer e, û ew hîn jî tu pênaseyeke fermî ya rêveberiyê nas nake. Ji ber vê yekê karê me di aliyên siyasî, ragihandin û di nava civakê de bi rêya nûner an kesên ku bi van xebatan re hatine erkdarkirin, sînordar e.

Têkiliyên bi sazî û aktorên siyasî û civakî yên Lubnanî re ne fermî ne. Herî zêde li ser bingeha diyalog, ragihandin û danûstandin tê meşandin. Di vê çarçoveyê de bi bihêztirîn û mezintirî siyasetmedarên partî û aliyên cuda re hevdîtin û danûstandin hatine kirin, her wiha di çalakiyên sivîl û civakî de beşdarbûna me çêdibe da ku ezmûn û tecrûbeya Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi wan re bê parvekirin û naskirin. Di heman demê de pirsgirêkên hevpar



ên girîngiya Kurd, Ereb û Lubnanî tên nîqaşkirin. Her wiha bal tê kişandin ser avakirina têkiliyan bi rayedarên olî, hin sendîka û rêxistinên civaka sivîl re.

Li ser vî bingehî em dikarin bêjin ku hebûna Rêveberiya Xweser li Lubnanê hebûneke siyasî û manewî ye. Armanca wê pênasekirin û belavkirina projeya Rêveberiya Xweser her wiha di çareserkirina aloziya Sûriyê de nêrîna xwe parve bike ye. Di heman demê de armanca me bi civaka Lubnanê re torên têkiliyan ava bikin ku bandorê li ser dîmena herêmî bike.

**Têkiliyên we bi partî û hikumeta Lubnanê re çawa ye û gelo xebatên hevbeş di navber we û wan de hene?**

Peywendiya bi partî û hikumeta Lubnanê re, peywendiyeke danûstandin û diyalogê ye, ne şirîkatiyeke fermî ye. Hikuketa Lubnanê weke ku me aniye ziman tu statuyeke fermî di welatê xwe de nedaye Rêveberiya Xweser. Lê belê têkilî û danûstandinên me yên ne bi awayekî rasrerast bi hin saziyan re hene ku derfeta parvekirina nêrînan pêş bikevin. Her wiha nîqaşkirina rêveçûnên girêdayî dosya Sûriyê tên kirin.

Li ser asta partî û hêzên siyasî, civîn û danûstandin bi pêkhateyên cihêreng ên Lubnanî re tên kirin, ji partiyên neteweperest û çepgir bigire heya hêzên demokratîk û sivîl. Ji bilî hin kesayetên di tevgerên mezin de. Armanca van civînan ew e ku nêrîna Rêveberiyê di çareserkirina alûziya Sûriyê de tê şîrovekirin. Herwiha li ser mijarên hevpar nîqaş tên kirin ji wan li ser rewşa penaberan û piştgirîya aramiya di Lubnan û Sûriyeyê de.

Lê di aliyê xebata hevbeş di warê cîbicîkar an sazîbûnê de, ew ji ber xwezaya rewşa siyasî ya Lubnanê û aloziyên wê hinek bi sînor e. Lê ew di asta însiyatîfên bîrdozî, konferans û diyalogan de heye ku dixwazin çanda jiyana hevbeş pêş bixin û têkiliyên Kurd-Lubnanî-Sûrî xurt bikin.

**Lubnan çiqas bi pirojeya Rêveberiya Xweser bawer dike, herwiha pirojeyên we yên dema pêş çine?**

Hikumeta Lubnanê mîna hikumetên din ên herêmê, bi baldarî li gel projeya Rêveberiya Xweser tevdigere. Her çend bi fermî piştgirîya wê nake jî, lê ew baş dizane ku ev proje li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûye rastiyek û roleke wê girîng di parastina aramiyê û şerê li dijî terorê de heye. Ji vir dikare were gotin ku helwesta hikumetê nêzîkî bêalîbûna erênî ye, ji ber ku ew bêyî ku bikeve nav pevçûnê an jî naskirina fermî, nêz dibe.

Ji bo projeyên pêşerojê, hebûna rêveberiyê li Lubnanê siyasî, çandî û civakî ye, ne cîbicîkar e. Ji ber vê yekê, plan û projeyên me li ser van mijaran disekinin:

-Xurtkirina diyalogê bi hêzên cûrbecûr ên Lubnanî re derbarê pêşeroja Sûriye û herêmê de.

-Lidarxistina semîner û konferansan ji bo şirovekirina ezmûna rêveberiyê û nîqaşkirina rêyên dîtina çareseriyekê demokratîk ji bo alûziya Sûriyê.

-Ji bo afirandina qadekê ji bo pêşvebirina projeyê û felsefeya wê bi saziyên akademîk û medyayê re têkilî daynin.

-Avakirina têkiliyan bi rêxistinên civaka sivîl ên Lubnanî re, bi taybetî yên ku bi mafên mirovan, pirsgirêkên jinan û ciwanan ve girêdayî ne.

-Tensîq li ser pirsgirêka penaberên Sûrî bi rêya danûstandina nerînan ji bo dîtina çareseriyên mirovî ku rûmeta penaberan biparêzin û berjewendiyên Lubnanê li ber çavan bigirin.

-Li ser van bingehan; Projeyên me li Lubnanê di çarçoveyek siyasî, rewşenbîrî û çandî de dimînin, dûrî her çalakiyek cîbicîkar an rêveberiyê di nav dewleta Lubnanê de.

## Ew ê di dawiyê de bi «Hevalê min Trump» re hevdîtin bike!



**Zekî Bedran**

Di êrîşeke çeteyên girêdayî Tirkiyê û HTŞ'ê li ser gundekî girêdayi herêmên xweser a Dêr Hafir de heft kes hatin qirkir in. Kesên ku hatine qetilkirin, di navbera 1 û 75 salî de bûn. Ev welatî pir xizan bûn û ji bo jiyanê têdikoşiyan. Komkujiya bi sed hezaran kesan li Sûriyê eşkere ne bes bû. Bi qirkirina van kesan çi berjewendiyên siyasî tê xwestin? Kesên ku li ser xwînrijandin, tundî û tirsê siyasetê ava dikin dikarin çi rêbazê pergalekê ava bikin? Pir girîng e ku ev mijar bi ciddî werin nirxandin û helwestek li gorî wê were destnîşankirin. Her wiha divê were fêmkirin ku ev kiryar û peyamên ku têne şandin ji ber gefên komkujî û qirkirinê ne. Wezareta Parastina Neteweyî ya Tirkiyê dibêje, "Heta ku terorîzm bi dawî nebe, em leşkerên xwe ji Sûriyê venakişînin. Ger ku kiryarên terorî bi dawî bibe, dibe ku em vekişînê bifikirin." Wezareta Parastina Neteweyî kî, kîjan hêz, wekî terorîst pênase dike? Ew bi HTŞ'ê ve di hindirê hev de kar dikin. Ew dibêjin ku ew ê piştgirîyek bê şert û merc bidin HTŞ'ê. Ew hewl didin ku HTŞ'ê demên xwe yê borî ya xwînî ji bîr bikin. Mîna ku ew ji hêla cîhanê ve wekî rêxistinên terorîst nehatibin binav kirin. Ew li ser vekişîna ji Sûriyê tiştek nabêjin. Ew dibêjin ku heke terorîzm bi dawî bibe, dibe ku ew vekişînê bifikirin. Ew bi eşkereyî dibêjin ku ew li vir in û wê li Sûriyê bimînin. Ji ber ku HTŞ û hêzên din ne terorîst in, QSD dimîne. QSD ji hêla tu hêzek cîhanê ve wekî terorîst nehatiye nas kirin. Berevajî vê, QSD, digel hevpeymaniya mezin a ku DYA û welatên Ewropî di nav de ne, li dijî DAIŞ'ê şer kir û bi vê hevpeymaniyê re dixebite. Lê, Tirkiyê, ji ber ku QSD Kurdan di nav xwe de digire, ew wekî dijminê xwe yê herî mezin li Rojhilata Navîn, ragihandiye. Wê gelek caran êrîşî herêmên xweser kiriye û rêjeyekê mezin axa Kurdan dagir kiriye û vê dagirkeriyê heya roja îro jî didomîne.

Desthiladariya Erdogan bi tundî dixebite ku HTŞ'ê li dijî QSD'ê û Rêveberiya Xweser bi kar bîne. HTŞ bi tevahî hatiye dorpêçkirin. Hewldanên mezin têne kirin da ku rê li ber lihevkirinek bi QSD'ê re û avakirina aramiyê li Sûriyê bigirin. Rayedarên Tirk lingekê xwe li Sûriyê danîne. Niha destwerdana karûbarên navxweyî yên Sûriyê ji rêzê dibînin. Ew ji HTŞ'ê jî di her mijarê de israr dikin ku Sûriyekî yekdest û navendî ava bikin. Armanca wan ya sereke ew e ku statu û destkeftiyên Kurdan neb e. Ji bo wan ne xem e ku Sûriye pêşerojek gengeşî û tarî de ye an na. Ew di her alî de amade ne ku pêvajoya aştî û çareseriyê li Tirkiyê têk bibin. Bi rastî, xuya ye ku ew pêvajoya aştiyê wekî pirsgirêkekê naskirina Kurdan bi maf û nasnameyên wan nabînin. Ew wê wekî rêyekê ji bo xilasbûna ji "sosreta PKK û gerîlayan" dibînin. Meh ji li ser banga Rêber Apo û kongreya PKK'ê re derbas bû. Hîn jî pêngavekê berbiçav tine ye. Di bersivê de, gefên li ser Rojava bênavber berdewam dikin. Bi avêtina Kurdan li Rojava nav lepên qirkirinê, dê çawa yekîtî û biratî di navbera Kurdên li Tirkiye û Rojhilata Navîn de were pêş xistin? Ji bo tevlîbûna artêşa Sûriyê, hewleke mezin ji bona tevlêkirina QSD'ê tê dayîn. Lê gelo diholê de artêşeke Sûriyê heye? Hemû komên çekdar ên di nav HTŞ'ê de hebûna xwe didomînin. Komên çekdar ên ji aliyê artêşa Tirkiyê ve hatine sazûmankirin, hespên xwe weke hezdikin dibezînin. Di bersivê de, ew dixwazin hêzek mîna QSD'ê bixin bin serweriya HTŞ'ê de. Diyar e ku plansaziyekê xerab heye. Planek heye ku Kurd û herêma xweser bêparastin û li hember êrîşan bêparastin bihêlin. Wekî din, QSD nabêje, "Ez tevlî artêşê nabim." Ew dibêjin, "Divê ez herêma xwe biparêzim heta ku destûrên zagonî û fermî werin bicîhanîn."Bêçekkirin û hilweşandina QSD'ê di demekê de ku dewlet û pergal hildiweşin û pergalekê nû nehatiye damezrandin, tenê bi dijminatiya kûr û niyeta xerab dikare were ravekirin. Erdogan bi kelecan li benda hilbijartina Trump bû. Trump, ku li pişt wêrankirin û komkujiya Xeza'yê ji aliyê Îsraîlê ve ye, hevalbendekê pir girîng ê Erdogan e. Ew axaftina xwe bi "Hevalê min Trump" dest pê dike. Kesekî ku piştgiriyê dide wan kesên ku ev yek anîn serê Filistîniyan, çawa dikare bibe hevalbendê Erdogan? Erdogan Netanyahu wekî Hitler û yên wekî wan bi nav dike. Ew her tim rexne li Îsraîlê dike, lê di heman demê de Serokê DYA Trump, ku di her mijarê de piştgiriyê dide Îsraîlê û Rojhilata Navîn li gorî şêwaza xwe ya desthiladariyê ava bike, wekî hevalbendê xwe pesnê wî dide? Trump plan dike ku Xeza'yê veguherîne beşekê erdê bazirganiyê û otêl û kazînoyan li ser axê ava bike. Tevî vê yekê, sedema ku Trump wekî hevalbendê xwe binav dike çi ye? Sedema herî mezin a gotinên ku weke "hevalbendê min Trump" careke din dijminatiya li dijî Kurdan dixe li ber çavan. Berê wan bi lihevkirinekê bi gel Trump re herêmên mîna Serêkaniyê dagir kirin. Niha ew bawer dikin ku ew dikarin bi Trump re danûstandinan bikin û dîsa lihevbikin. Ew bawer dikin ku dema ku ew bi milyar dolaran pêşniyaran pêşkêşî Trump bikin, ew dikarin li ser Kurdan bazirganiyê bikin. Plansaziya herî girîng a danûstandinê ya Erdogan li Qesra Spî careke din dê li ser piştgiriya ji bo şerê dijî Kurdan be. Planeke din jî dê ew be ku ji Trump piştgirîyê werbigire da ku li ser desthilatdariyê bimîne.

## Sozên ku Colanî dabû Ewropiyan



**Farûk Sakik**

Ajansa Reutersê ya ku navenda wê li Londonê ye, van rojan gotar û nirxanedinek li ser rewşa Sûrî hebû. Dihat gotin, heger Colanî bersiv nede daxwazên ol û netewên wek Kurd, Elewî û Durziyan, mafê wan di qanûn û destûra bingehîn de mîsoger neke, pêşî li çanda bihevre azad bijîn veneke, mafê hemwelatiyê nede wan, wê şerekê navxweyî ji nû de dest pê bike. Colanî heger van yekan pêk neyne wê nikaribe pêşî li vî şerê nû bigire û ev şer wê bi salan dom bike.
Tişta herî balkêş li gor dîroknaz Faîk Bûlût ku ji arşîvan derxistiye, Colanî di sala 2001'an de saziyek nêzî îstixbarata Îngilizan bi navê Înter-Medîa de, 2 salan hatî perwerdekirin. Di vê perwerdehiyê de mijara esas bi rojavare-Ewrûpa re çawa dikare di nav ahengiyekê de bixebite.
Piştî demekê jî rojnamevanek bi Colanî re hevpeyvînek çêkir. Colanî digot, berjewendiyên we yên vê derê herî baş ezê biparêzim. Ev hevpeyvîn deng vedide. Li ser vê yekê dewletên Ewrûpa, Îngiliz û Amerîka bi wî re kontakt datînin.
Piştî ku ji Îdlibê şer dane destpêkirin û Heleb hat dagirkirin, di hevpeyvîna ku dabû CNN Înternasyonal de digot; Em ê wek rejima Esad nebin. Em ê nêrînên her aliyan bigirin. Em ê destûr nedin ku di navbera mezheban de şer derkeve. Hin sozên dinan jî dabû. Ewrûpî û Amerîka bawerî bi van sozan anîn.
Piştî Şam bidestxistin diplomatek bi navê Barbara şandin cem Colanî. Ji colanî re got li hember kêmnetewan û baweriyan maqûl tevbigerin. Sîstema rêveberiya we bila sîstema Şerîatê nebe. Heger vanan pêkneyên ji bo we ewê nebaşbe. Piştî vê yekê heyet li ser heyetê derbasî Şamê bûn. Piştgiriyek mezin dane Colanî. Lê Colanî sozên ku dabû rojavayiyan pêk neanî. Êrişî Elewî û Durziyan kir. Anha jî hewldide êrişî Kurdan bike.
Ji bo Şamê îroj ev yek tê nîqaş kirin, gelo heger êrişî herêma Kurdan bike û komkujiyan pêkbîne wê Amerîka û Ewrûpî dawî li desthilatdariya wî bînin, an na?
Baş e, dema ku ew Colanî jî vê yekê dibîne û ji salên mêjde soz dayî wan ku ewê rejimek demokratîk avabike, çima îro li gor Tirkiyê tevdigere? Tirkiye li hember Ewrûpiyan wê bikaribe wî biparêze? Na, ne mumkune. Heger hetanî roja me êrişî Rojava nekirbe, nîqaşên wan yên bi Amerîka û Ewrûpiyan re hênjî dewam dikin. Ya din jî Colanî bê piştgiriya Tirkiyê nikare bi QSD'ê re şerekê bide destpêkirin. Hêza QSD'ê baş nasdike. Li Kobanê û li heremên dinan li hember Kurdan çend cara darbe xwarî, ji bîr nekiriye.
Tirkiye jî di qada navnetewî de dest bi xebatên dîplomasiyê kiriye, da ku Kurd bê şer entegreyî-teslimî rejima Şamê bibin. Berê dema xebatên dîplomasiyê dikir, ji wan re digotin li heremê PKK heye. Em bi PKK'ê re di şer de ne. Hebûna wan ya li heremê ji bo me tehdîde. Dewletên wek Rûsya û Amerîka dihatin qanî kirin û destûra dagirkirina Efrîn û Serêkaniyê dihat girtin. Lê dewleta Tirkiyê îro bê van hincetan dîplomasî dike û sîstema rêveberiya xweser ya demokratîk ji bo yekparebûna Sûrî wek taluke nîşan dide. Heger van dewletan bi van derewên wan bawerî banîna zû de dest bi qetlîam û komkujiyan kiribûn. Heger dewleta Tirkiyê berjewendiyên Sûrî difikire û diparêze, çima li hember erişên Îsraîl bertek nîşan nade?
Dewletên wek Îngiliz, Amerîka û Ewrûpî divê destûr nedin ku Tirkiye li Sûrî ji nû de şerê navxweyî bide destpêkirin. Divê sozên Colanî dabû wan jî bi bîra wî bixin da ku dibin bandora Tirkiyê de nemîne.